## Çima Nameya Razîbûnê?

Analîz û vekolandina karîna potensiyel ji aliyê dibistanê bixwe va pêk nayê. Ji ber vê sedemê, divê nav, paşnav, pol û dibistanê zarokê te ji aliyê hevkar ra bihêne şandin. Bo vê meremê razîbûna te pêwîst e. Ev zanyarî li gorî pêdiviyên qanûnî dihêne vekolandin û demeke kurt piştî analîz û vekolandina karîna potensiyel dîsan dê werin jinavbirin.

## Di dewamê da dê çi biqewime?

Analîz û vekolandina karîna/şiyana potensiyel yek ji pêngavên seretayî yên rênîşandana şixulînê ye. Girêdayî bi cûreya dibistanê û pola perwerdehiyê, di dewamê da pêngavine zêdetir di rêgeha qedandî ya ber bi şixulînê va hene.

Li adresa www.elternpower-brandenburg.de tu dikarî rênimandina şixulînê li Eyaleta Brandenburgê bibînî.

## Erka min çi ye?

Di rênimandina şixulê da, tu/hûn wek dêûbav aliyekî girîng ji bo zarokê xwe yî/ne.. Ji ber vê ya, bi dû gotûbêja li ser vê mijarê be.

Li ser tecrube û serpêhatiyan bipirse û derbarê pêngavên din biaxive. Wek mînak:

**(Sê babet ji) xalên te yên hêzê yên herî mezin çi ne?**

**Kîjan spartek zêdetir ji hemiyan bo te bi kêf û lezzet bûye?**

**Tu dixwazî di çi karekî da xwe bicerribînî?**

**Te çi cûre zanyarî hîn tunene?**

Dergeh planet-beruf.de ji bo dêûbavan jî pêşniyazine sûdewer raber dike:

https://planet-beruf.de/eltern-und-erziehungsberechtigte

## Berpirsa bersivdêr

Yekem berpirsa bersivdanê ji bo hemî pirsên têkildarî rênimandina şixulînê û analîz û nirxandina şiyana potensiyel, dibistana zarokê te ye.

Mora dibistanê

## Lînkên alîkar

Ajansa Kar (Agentur für Arbeit) jî hin rênimandinan ji bo dêûbavên ku hevrêtiya zarokê xwe di bijartina şixulê û perwerdehiya li zanîngehê dikin, raber dike.

www.arbeitsagentur.de/bildung/schule/ tipps-fuer-eltern

MBJS di rûpela xwe ya sereke da zanyarîne têrûtijî li ser rênimanidna şixulînê li Eyaleta Brandenburgê raber dike.

mbjs.brandenburg.de/bildung/uebergang- schule-beruf/berufliche-orientierung.html

Navenda Projeya Analîz û Vekolandina Şiyana Potensiyel a Brandenburgê (Projektstelle Potenzial-analyse Brandenburg) Berpirsa Hevahengî û Cihanînê ya Analîz û

kobra.net
Beratung.Bildung.Brandenburg

Kompaniya bi berpirsyariya sînordar a Navenda Projeya Analîz û Vekolandina Şiyana Potenisyel (Projektstelle




Roj 06.02.2024

KURMANDSCHI

# Analîz û vekolandina şiyana potensiyel

Hin zanyarî ji bo dêûbavan



GEFÖRDERT VOM
Bundesministerium für Bildung und Forschung

LAND BRANDENBURG
Ministerium für Bildung, Jugend und Sport

## "Dixwazî di pêşerojê da şixula te çi be?"

Gengaz e ku hemî dêûbav vê pirsê ji zarokên xwe dipirsin. Ji bo ku zarokê te bikare bersiva vê pirsê di dawiya heyama perwerdehiya li dibistanê da bide, ji pola 7an va rênimandina şixulînê bi awayekî berfirehtir dest pê dibe.

**Pêngaveke seretayî ya analîz û vekolandina şiyana potensiyel e.**

## Analîz û vekolandina şiyana potensiyel ji bo çi ye?

Di dema analîz û vekolandina şiyana potensiyel da zarokê te xalên hêzê û meyl û alîgiriyên xwe baştir nas dike. Ev kar tecrube û serpêhatiyên serkeftî pêkan dike û wêratiya teşepêdana pêeşroja xwe dide kesî.
Mijar li ser naskirin û serrastkirina xalên lawaziyê nîne. Di dawiya analîz û vekolandina şiyana potensiyel da şîreta şixulînê yan hêjatiya ji bo şixulekê nayê ragihandin.


Lêbelê zarokê te divê were handan ku bide pey eleqe û meraqên xwe. Ew divê bikare bixwe biryar bide ku di çi alîgiriyeke şixulînê da dixwaze xwe sazgar bike da ku wek mînak fêrbûneke kar a guncan bibijêre.





## Di dema analîz û vekolandina şiyana potensiyel da çi diqewime??

- Erk û spartekên cûrbicûr di ko0mên biçûk da yan bi tenêtî dihêne vekolandin û rahênan.
- Di vî warî da şiyan û karîn dihêne dîtin û nirxandin.
- Yanî dê were dîtin ku çwaa nûciwan spartekan bi cih tînin, çi îde û ramanan digirin ber xwe û çawa di komê da dixebitin.
- Di vî warî da mijar li ser zanyariyên dibistanê nîne.





Piştî derdora du hefteyan civîneke gotûbêjê ya nîv-saetî ji bo nirxandinê dihê lidarxistin. Tu wek dayîk/bav dikarî tê da beşdar bibî.
Di gotûbêjê da mijara tecrubeyên zarokê te û xalên hêzê yên hatine dîtin, dihêne behskirin. Her wiha zarokê te derbarê vêya ku çawa dikare zêdetir ji hêla şixulînê va xwe saz bike, hin pêşniyazan werdigire.

Ev tecrube li profîleke xalên hêzê dihêne tomarkirin. Ev profîl ayîdî zarokê te ye û divê di Destûra Bijartina Şixulê (Berufswahlpass) da were hilgirtin. Dibe ku ev profîl ji bo daxwazên wergirtinê were bikaranîn.

## Mînak ji bo rahênanekê – Koma Hevmalan

Nûciwan divê wek Koma Hevmalan xaniyekî hevpar dîzayn bikin. Di vî warî da divê wek mînak li ser vêya behs bikin ku ode çawa divê werine dabeşkirin û bikaranîn. Dîzayn divê were hesabkirin û kirê jî bihê dabeşkirin. Ji bo vê mebestê, nûciwan divê bi taybet armancê berçav bigirin û pêşniyazinan raber bikin (şiyana çareserkirina pirsgirêkê), bi awayê beraqil heger û delîlan bînin (şiyana danîna têkiliyê) û rê bidin kesên din ku ew jî nêrînên xwe raderbirrînin (şiyana çareserkirina nakokiyê).




## Divê bala xwe bidime ser çi?

- Analîz û vekolandina Şiyana Potensiyel ji aliyê komeke fêrbûyî ji aliyê terefa hevkar bi giştî li derveyî dibistanê bi cih tê.
- Ev kar tevî hesabkirina demên bêhnvedanê derdora şeş saetan dem dibe.

Nûciwan hevrê digel kesekî diçine cihê projeyê.

- Yanî ew roja perwerdehiyê dibe ku piçekî zêdetir ji asta asayî dem bibe. Dibistan dê demên deqîq û eseh ragihîne.

